


Zimanê kurdî .. Ji «HAWAR»ê heya îroj



PEYVA WELAT

Zimanê kurdî .. Ji "HAWAR"ê
heya îroj

Desteya sernivîs

2 Sed sal bêtir, bi hemû şêwazan şerê gelê kurd tê skirin. Hişmendiya hêzên dagîrker heya îro negihîştîya wê astê ku mafê gelê kurd wekî gelekî ku li ser xaka xwe ya dîrokî dijî bipijirîne û nas bike.

Heya îro roj hewldan û pîlanên qirkirin û bişaftina gelê kurd qet ji rojeva dagîrkerên kurdistanê ranebûye, herî dawî jî li Efrînê û bi rengê berfireh ev plan tene pêkanîn.

Li hemberî vî şerê qirêj, gelê kurd neçare ku li ber xwe bide, û hebûna xwe biparêze.

Şerê çandeyî Yek ji awayên şer yê herî qirêj e ku li dijî kurdan tê bi kar anîn bûye, bi dehê salan çanda kudî ji hêla hêzên dagîrker ve hatibû qedexekirin, di encamê de, piraniya gelê kurd ji çanda xwe hate bi dûr xistin, û li şûnê çanda gelê serdest cihê xwe di nav civaka kurdî de girt, her wiha ziman û çanda kurdî li paş ma.

Bêguman dagîrkerên kurdistanê bi zanebûn ev şer meşandin, çiku wan xweş dizanîbû ku hebûna gelê kurd girêdayî hebûna çanda wî ye.

Li hemberî siyaseta bişaftinê tevgerê li ser asta kata bijarde ya rewşenbîrên kurd derkete holê, serkêşê wê ronakbîrê kurd Celadet Bedirxan bûye. Têzanî ku Ji bo berdewamiya hebûna gel ziman mercekî sereke û bingeîn e çiku ew hilgirê çand û nasnameya gel e.

Em dikarim bibêjim ku yekemîn şoreşa zimanî di dîroka gelê kurd de di 15-5-1932an de bi derketina hejmara yekem ji kovara Hawarê re

Kovara WELAT
Çandî- Giştî- Mehane

Sernivîser:
Aras Yûsiv

Desteya rêvebir:
Imran Yûsiv

Dizayner:
Hesen Berzencî



Têbînî: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne

ji bo têkiliyê:

welatpress2014@gmail.com

www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

hate li darxistin.

Di Hawarê de, cara yekem Elfabeya kurdî ya bi tîpên latînî hate belavkirin, bi vê yekê zimanê kurdî gaveke pir mezin ber bi zimanê nivîskî ve avêt, her wiha rêzmana Mîr Celadet bû bingeheke xurt û çavkaniyeke zela ji bo rastnivîs û rastxwendina kurdî. Îro roj, li Rojavayê Kurdistanê derfet peyda bûye da ku mirovê kurd bi zimanê xwe bixwîne û binivîse, bi rastî ev xewnek bû, cara yekemîne ku zimanê kurdî derbasî dibistanan dibe, û zarokên kurd bi zimanê dayika xwe dixwînin, her wiha zanîngeh û peymangehêz ziman jî hatine vekirin, ev tevde dikevin xizmeta pêşxistina zimanê kurdî de û di pêşeroja nêzîk de dê encamin baş bidin.

Raste rewşa zimanê kurdî ya îronî ne li gorî hêvî û daxwazan e, çiku piraniya nivîskar û rewşenbîrên kurd bi zimanê biyanî dinivîsin, lê baweriya me bi nîşê me yê nû yê ku îro bi zimanê xwe dixwîne heye ku karibin zimanê kurdî ber bi astin bilind û pêşketî ve bibin, em geşbîn in ku pêşeroj ya zimanê kurdî ye û dê cihê xwe di nava zimanên cîhanî de biqire. ■

تَبْنِي ثَوْرَةَ
adopt a revolution

ÇÎVANOK ÇÎYE ?



Salihê Heydo

Di folklorê kurdî de gelek çîrok, serpêhatî û çîvanok hene. Gotina çîrok ji kurtkirina (çelrok) hatiye, ji ber ku ew çîror dûdirêj bû, û di çel rojî de bi dawî dibû, û di ode û dîwanxaneyan de zilaman bi şevan û bi taybetî zivistanan lê guhdarî dikirin, û rûmeta wî çîrokbêjî digirtin, ku bûyerên wê weke xelekên televîzyonê her şev lid û hevdû dihatin û bi hev ve girêdayî bûn, çî di biwara serpêhatîyên rast û jîwarî de û çî di biwara destane û efsanan de .

Lê çîvanok çîrokên herî kurt bûn, û lihevhatî bûn, wateya wê ji (şevanok) hatiye, ango ew di demeke kurt de, di şevê tenê de û bi gelemperî ji zarokan re dihate gotin.

Derheqa ku zarokên biçûk bi ser dê û bavên xwe de digiriyan û digotin ji me re çîrok û çîvanokan bibêjin, dê û bavên wan devê wan ji ser xwe digerandin û bi tiştêkî kurt ew tanîne ser rê û razî dikirin, heger bê wate bûn jî lê gotinên wan paqij, şêrîn û lihevhatî bûn ku giyan û ruhê zarokan bi zimanê kurdî ve, bi zimanê dayikê yê şêrîn ve dihatin girêdanê.

Gencîne û xizna folklorê kurdî ji vî curreyî tije û dagirtî ye, lê di van salên dawî de pîrraniya wan hatine ji bîr kirin û windabûne, û jiyan jî ne jiyan berê ye.

Ji ber gelek sedeman pêdivî ye ku ev cûre ji tora zarokan ; çîvanok, zûbêjî, hejmarok, lorîk û mamik bêne parastin û nivîsandinê û her nivîskar, folklorist û lêkolîner vî celebî ji xwe re histûbarî û erkeki neteweyîyî pîroz û giranbuha bibîne.

Ez dixwazim div î derbarî de çend nemûneyên kurt ji we re xuyanîkirin bidim, da zînet û xweşbûna wan ber bi çav bibe :

Çîrokê

Çîrokê

Çîvanokê

Xetxetokê

Xeta têrê

Çû bajêrê

Derpî pane

Li nav niganê

Golka dana

Çû meydana

Ez kuncî, tu kuncî

Ser textikê firincî

Ez firyam, tu ma l cî.


Ev nemûneya jorîn bi awayekî helbestî hatiye hûnan û ristin, bêguman weke her meteryalên zargotinê ew jî pir nemûne ye û ji cihekî heya cihekî dîtir hin guhertin di naverok û forma wê de çêdibin, lê dîsa di heman wateyê de dimîne.

Ker û kundir
Hebû kerek û kundirek
Û dasek û biverek
Û cotek û qantirek
Û pîrek û bizirek
Go ker kundir kot û kot
Û dasê bivir sot û sot
Û cotkarî qantir bire cot
Û pîrê bizin dot
Şîrê wê bir bajêr û firot
Û min çîroka xwe ji te re got
Bela êdî ji min veke
Te dil û kezeba min sot.

Çi hebû
Çi hebû çi nebû
Tu ji xwedê mestir nebû
Ê pîs sehê me bû
Koçikê bermala me bû
Ê baş ew meznê me bû
Iblîsê bêvil teşî
Li ser bana dimeşî
Gelacî jê diweşî

Kêzik û tepik
Go hebû qirşikek
Û hebû tertikek
Û hebû kêzikek
Ba hat, qirşik firya
Baran hat, tertik hilya
Go hingî kêzê Kenya û kenya
Rovîtirtirka wê qetya

Ev hersê mînakên ku me anîn kifşê bi awayekî bexşane û lihevhatî hatine gotin.
Bêguman ev çend nemûneyên ku min ji çîvanokan anîne bi qasî wan hîn bi sedan jî hene,
lê tenê weke nemûne min ji xwînerên kovara Welat re anîne kifşê. ■





*Bo malbata Mihemd Sedîq Bilê**

Dema em, bi hev re binav bûn_ derya kûr bû, ne? Derya tarî bû? Pîs bû?

Îşev bi tena xwe vedigerim malê, kolan dirêj e, bahoze kolanê dimale û helbesteke min li ser zimanê min e, helbest dibêje: Ewte-ewta kûçikên bi şev li kolanê beredayî te natirsîne. Ewte-ewta kûçikan ji te re dibêje ku mirov razayî ne. Helbesteke din li bala min dixê, ber bi nivîsandinê de, lê derya kûr e, ez jî binav destê sê zarokên nû pişxivî digirim, bêhna min diçike, derya min li ber xwe dibe, min tavêje çepî kolanê, kolan kûr e weke deryayê, weke helbestê. Destekî xwe dirêj dikim dîwar, çixareya di destê din de veketî tiliyên min dişewitîne û serê min ji min dikeve, tu li bîra min î nuha, zarokên te li ber çavên min, bi min re binav dibin û xanima te qîr dike, devê helbestê digire, bo zarok tiştêkî nas nekin_ derya kûr e ne, derya har e.

Hewil bide cara dawî destê xanima xwe bigirî, cara dawî riwê zarokên xwe ramûse, bi guharê wan bilîze, kenê dawî bi wan de qena helbest, bi qasî êşê derbikeve, êş bedew be weke tolhildanekê ji dîmena dawî, ji pêlan, dema ez û tu cara dawî li hev binihêrin û binav bibin di helbestê de, tu dibînî?

Ev ne lêvên deryayê ne weke ku ji me were? Ev ne xewn e?

Kolan, weke deryayê sar dibe, weke deryayê min li hev digêrîne, weke helbestê,

ne deriyê malê, ne jî beravek ji asoyan dibe, bitenê em in, gotinên dawî yên ne bi dilê deryayê dibêjin. Gazinan dikim: Çi te bi ser sînga deryayê de anî !?

Bi rastî welatê me nema hêja ye em li wî bimrin?

Xuhdaneke germ te digire, bi deryayê dikevî, ne dizanim li bersivan digêrî, yan deryayê derbas dikî, ber bi jiyanê de, matmayî li te dinihêrim û binav dibim, hevalên min yên çûyî li bîra min tên, hemî kesên çûyî, hemî tişt û çûyînan kom dikim bo helbestê, tu jî zarokên xwe razî bike ku ev lîstîkek e, derya hevala me ye, bi me şa dibe.

Kolan, bi tariya xwe har dibe weke deryayê, weke deryayê bi dawî nabe, weke helbestê, em li ber xwe didin, xwe bigihînin jiyanê li paş van pêlan, li paş vê kolanê, li dawiya helbestê û qîrîn bi zarokên te dikeve, bang li diya xwe dikin, bang li min û te, em xwe zer dikin deryayê, li esîman dînhêrin, pêlek radihêje me, me ber bi riwê wan de dibe, pêlek me dûr dixê, parçek dike, em dixwazin pêlan bixwin, deryayê gez bikin, dixwazim deryayê têxim tûrikê xwe de û tûrikê min ji min dikeve, ji helbestê, qîrîn bi zarokên te dikeve, bi me û hewarên xanima te helbestê divecniqîn, awirên min û te jî deryayê, lê derya kûr e, derya tarî ye, pîs e.

Esîman çi xweşik in îşev. Ji te re dibêjim û derya har wêneya esîmanan wêran dike, derya serê xwe bixwe, nemîne.

Dîmena dawî ye, hîna em bi hewara hev ve tên û pêl me parçe dikin, hîna em qîr dikin û aso dûr in bi qasî jiyanê, bi qasî jiyanê aso xwe ji me cuda dikin, li der dora me tev derya ye, har e, li jor me, li jêr me_ divê em nas bikin: Ne kevokek li esîman heye ku nameyekê bigihîne bendewarên me, ne nameyek, bitenê derya nameya me ya dawî ye, wê ji kesên mayî re dihelin, hewil didin bigihêjin hev, careke din hev ramûsin, destên hev bigrin û pêl me belav dikin, em hewil didin, lê derya kûr e, kûr e ha, derya tarî ye, pîs e. Tu ji min re dibêjî weke bersiveke dawî ji gazinên min re û berê xwe didî aliyekî din: Em hev nebînin çêtir e û derya devê xwe vedike, kolan jî bi helbestê re û em binav dibin, li wir hûn di deryayê de, li vir ez di helbestê_ helbest kûr e ha, helbest tarî ye, helbest pîs e. ■

**Mihemed Sedîq Bilê*

ku li gel xanim û her sê zarokên xwe, di deryayê de, li Yûnanistanê, di bobelatekê de binav bûn.

كَأَنَّ عماد فؤاد لم يُغادر طفولته، التي عاشت طفولة الآخرين، ولم يُغادر بلده منذ سنوات طويلة، كأنه يعيش هناك بينما يحيا هنا، وهذا ما يُثير الكتاب من أحشائه؛ يقول: «بحقبة على الظهر/ ومعطف وحيد/ ينسى مسافر صورته المنعكسة/ على زجاج مطار مدينة ما/ .../ كأنه/ لم يعبر هنا/ أبداً».

(*) : صادرة عن دار ميريت في القاهرة ٢٠١٩.

(**) : شاعر مصري مُقيم في بلجيكا، من مواليد القاهرة

١٩٧٤.

صدرت له المجموعات الشعرية التالية: «أشباح جردتها الإضاءة» (١٩٩٨)، «تقاعد زير نساء عجوز» (٢٠٠٢)، «بكدمية زرقاء من عضة الندم» (٢٠٠٥)، «حرير» (٢٠٠٧)، و«عشر طرق للتكيل بجثة» (٢٠١٠).

كما صدرت له رواية وحيدة، بعنوان: «الحالة صفر» (٢٠١٥)، والإصدارين الأول والثاني لأنطولوجيا النص الشعري المصري الجديد: «رعاة ظلال.. حارسو عزلات أيضاً» (الجزائر ٢٠٠٧)، و«ذئب.. ونفرش طريقه بالفخاخ» (القاهرة ٢٠١٦).

ترجمت قصائده إلى العديد من اللغات العالمية الحديثة، من بينها: الإنجليزية والفرنسية والهولندية والإسبانية والألمانية والفارسية واللاتفية والروسية والرومانية.

عسكري إشارة المرور، والجندى الذي سقط من سيارة الجيش تحت عجلات سيارة الجيش...».

الصورة الشعرية في المقطع السابق تكاد أن تختفي تماماً، ليحل مكانها عنصر المفاجأة، سواءً من جهة اعتماده على المزيد من الإدهاش المرجو، أو من حيث سرده لأحداث متتالية ومتلاحقة، وكذلك الربط السلس فيما بينها.

الطفولة بوصفها منبت الشعر

من جهة أخرى، تحتفي قصائد مجموعة «تلك لغة الفرائس المخطوطة»، الواقعة في مئة وأربعة وثلاثين صفحة من القطع المتوسط، بعالم الطفولة البريء، بأحلامها وكوابيسها؛ طالما تُعرف الطفولة بأنها المنبت الأول للشعر، وحيث ينبغي أن ينطلق منه: «كنت صغيراً/ في الثامنة أو التاسعة/ حين علمني ابن عمي/ حيلته الجديدة: (سنربط المحفظة بخيط الثعبان، ونملؤها بجنيهاً مقصوصة من الكتب، يمرّ عابر في الليل، ونحن نمسك بطرف الحبل خلف حاجز الحطب/ حين ينحني/.. نشد)»، يتابع: «لأيام طوال/ كنا نختبئ في العتمة/ يمرّ عابر/ ويرى المحفظة/ وحين يقترب منها/ نشد/... نحن الواقفون/ خلف حاجز الحطب».

الذهني والجمالي، في تناول هموم الحياة المعيشة وتفاصيلها، نجده في المقطع السابق، وتحديدًا تلك الألعاب الطفولية، التي دأبنا على ممارستها على مرأى ومسمع الآخرين، على سبيل ملئ الفراغ. دون أن يسهو الشاعر عن مشاغل الحياة المعاصرة بضجيج مدنها والهدير المنبعث من مطاراتها.



«تلك لغة الفرائس المخطوطة»..

عماد فؤاد يرصد الواقع المأساوي للمهمشين



عماد الدين موسى



الليل/ محاولة إخافة اللصوص/ لبيعدهم عنّا/ نحنُ.. أبناء
الشوارع».


كتابة المستقبل المتخيل

بسرديّة حميمة، ونهايات شبه مفتوحة، يواصل عماد فؤاد بوحه الشفيف في كتابة الماضي والحاضر، مروراً إلى المستقبل المتخيل، إذ ما من أمل سوى تذكر تلك اللحظات الأنثوية/ العابرة، ومحاولة تدوينها شعراً: «أريد أن أكتب قصيدة عن الشاعر الذي بدأ كتابة قصيدة ولم يُتمّها، عن العاشقة التي أحبّت في المساء وكرهت في الصباح، عن الصبيّة منكوشة الشعر التي مدّت لي يدها في إشارة المرور، عن

يبدو أن الكتابة، الأدبية عموماً والشعرية على وجه الخصوص، تذهب نحو المزيد من الاختصار والتكثيف اللغوي، حيث أن التشذيب والحذف يُحرران النص من الحشو الزائد والترهل، ويجعلانه أكثر تمايزاً وسلاسة ومتانة، عدا الاشتغال على المفارقات العفوية والخبّية، والتي تكمن غالباً في النص القصير والقصير جداً؛ «بأقل قدر من الحروف/ بانعدامها أصلاً/ تقول الصرخة/ كل شيء».

في مجموعته الشعرية الجديدة «تلك لغة الفرائس المخطوطة» (*)، يرصد الشاعر المصري عماد فؤاد (***) الواقع المأساوي للمهمشين أو ما يسمّى بعالم الظل؛ ثمة عدسة الشعر ها هنا تدور وتدور، لتلتقط صوراً غاية في القساوة والانحطاط البشري، حيث الحياة المليئة بالمعاناة في ذلك القاع المظلم، يقول: «على الناصية المقابلة/ وفي الركن المغتم/ من مدخل البناية/ كان الشحاذ الأعشى/ يهذي:/ ناي واحد يا رب/ وأبكي هؤلاء الخلق/ على حالهم».

النبرة الحادة في المقطع السابق، وكذلك السخرية والتهمك من معطيات الواقع المرير، تنسحب على العديد من قصائد هذه المجموعة، بالإضافة إلى الوصف الدقيق للمشهد بحذافيره، وبلغة هادئة وجارحة في الآن معاً، وهو ما يمهد لرسم مشاهد متناقضة ومألوفة، تنتمي إلى عالم التشرد ومأخوذة منه وحده: «كنّا نعرف أنه يقلّد عواء الذئب/ كل ليلة على أطراف المدينة/ وهو نفسه/ الذي ينبّح نباح الكلاب المفترسة/ بعد منتصف



FEQÊ TEYRAN

Ew yek ji stûnên helbesta klasîk a kurdî ye, hîmek ji hîmên wêjeyê ye.

Navê wî yê rast Mihemed e, di nav gel de, herwiha li qada wêjeyê bi Feqê Teyran hatiye nasîn, dibêjin ku baweriya gel bi wê yekê dihat ku ew qencekî xwedê bûye, bi zimanê teyran (balindan) dizanîbû û bi wan re diaxivî, ji lewre navê wî bûye Feqê Teyran .

Di der barê dîroka ji dayik bûna wî de gelek gotegot hene, tê gomankirin ku ew derdora sala 1560 ji dayik bûye , û hemdemê Melayê Cizîrî bûye.

Feqê Teyran li Miskê ya bi ser Colemerga bakurê Kurdistanê ji dayik bûye û gelek dibêjin ku ew ji malbata mîrên Miskê ye,

Zanist û perwerdiya xwe ji çend dibistanên kurdistanê werdigire, ji wan dibistanan; (medreseya Mîr Hesênê Welî, medreseya Hîzanê, medreseya Cizîra botan û medreseya Finikê).

Qenatê Kurdo di pirtûka xwe de (Tarîxa Edebiyata Kurdî) dibêje ku Feqê Teyran helbestvan û dengbêjekî mezin bûye, gellek helbest, malik, xweşxan û stranên wî li nav gel belav bûne, ev berhem ne tenê di der barê hezkirin û evînê de bûn, lê ew wisa jî di der barê surîşt û fîlosîfîyê de hatine gotinê û lûlandinê.

Her wiha Kurdo destnîşan dike ku helbest û stranên Feqî nêzîkî zargotinên civakê bûye, carcaran folklor derbasî nav kiriye, û carcaran jî nivîsên wî derbasî nava folklor bûne.

Lêkolîner û wêjenas Ebdureqîb Yûsiv dibêje ku Feqê Teyran yek ji wan helbestvanan e ên ku binyada Edebîyeta kurdî danîne, ew helbestvanekî payebilind bûye, gelek berhevî li dû xwe hiştiye, berhevên nivîsarên wî gelek sade û sazrevan in, û nêzîkî şopa qesekirina camêriya xelkê ne.

Ebdureqîb Yûsiv berhevên Feqî li ser du cûreyan parvedike, ew jî evin :

A-Şiir, helbest û qesîdeyên belav-belav.

B-Çend çîrok û dastanên eynî û neteweyî.

Berhemên wî yên ku tên zanîn evin: Dîwan, Zembîlfiros, Şêxê Senan, Keleha Didim û Bersîsê Abid. ■

بوردِ حَمراءِ فهمتُ كلَّ اللُّغات

علاء الدين حسن

كواكب

عطر تتزيّن بها الطّبيعة .. علامات أنس ومسرّة .. صِلات بين القلوب والأرواح .. كم حرّكت فينا
عواطف الحبِّ والحنان ، وكم كانت وسيلة ودّ بين إنسان وإنسان . وقد بلغ من مكانتها أن جعلوا لها
في التاريخ مواسم ..
تبارك الرّحمن ، ما أبدع خلقه ! .. أودع الزّهرة معاني الجمال وصور الوفاء .. وبصحبة الورد يكون الأمل في الشّفاء ، وبقايات
الورد تهدأ النفوس .
لغة الزّهور هي لغة حبّ ، وقد قيل قديماً : وُلد الحبُّ مع تفتح زهرة في إحدى ليالي الرّبيع المقمرة ، ولكلّ زهرة في الهوى
معناه .
الزّهور ألوان وعطور ، بشاشة ورواء .. خواطر ترفُّ حول النّباتات رفيف الفراش في طبيعة ساحرة ، فالعلاقة بين المرء والحبِّ
علاقة بينه وبين الورد الجميلة .
وأسعد النّاس بالأزهار وأكثرهم تأثراً بها هم الأدباء والشّعراء والرّسّامون والمصوِّرون ؛ فهم الذين يستطيعون أن ينقلوا إلى النّاس
جمال الأزهار وأشكالها وألوانها الحافلة بالنّضارة والبهجة .
وإذا كان الورد الذي أوقد شاعريّة البحتريّ ، قد « نبّه النّيروز في غسق الدّجى » .. فإنّ ورد الطّائف أثار قريحة العديد من
الشّعراء المعاصرين ، حتّى أن فؤاد شاكر حيّاه بإحدى درره الشّعريّة الّتي قال في مطلعها :
يا رائع الزّهر في روض وبستانٍ أفديك بالحسن من حور وولدانٍ
* وما إن تشرق الشّمس وتلقي بأشعّتها الذهبيّة على الأزهار القرنفلية ، حتّى نتذكّر الورد وعبق عطره ينداح رفيفاً كالنّور في
الغسق .
وفي قصيدة له ، يقول صفيّ الدّين الحلّي متغنياً بالرّبيع وحسنه وورده :
فاصرف همومك بالرّبيع وفصله إنّ الرّبيع هو الشّباب الثّاني
وها هو الشّاعر عليّ بن الجهم يقول مصوّراً أثر الرّبيع والورد :
لم يضحك الورد إلّا حين أعجبه حسن الرّياض وصوت الطّائر الغرد
إنّما الزّهور .. تبعث في النّفس البهجة ، تماماً كالنّجوم المتألّفة ، فتبتسم لها الرّوح من طرب ، والطّير يشدو ، ولالأغصان
إصغاء .
** وشبّه الشّعراء إطلالة الحبيبة بإطلالة الورد ، فجماها وجمال الورد وجهان لصورة واحدة ؛ حيث يملأ قلب الحبيب وعينه
، كقول الشّاعر :
وصلت وكان الورد أوّل ما بدا فلما تولّى الورد ولّت مع الورد
وعن أزهار الأندلس وجمالها وسحرها وعبق رياحينها يقول ابن زيدون ، شاعر الأندلس الرّقيق ، بعد أن أدهشه الرّبيع ، ودكّره
بأنشودة الفؤاد – ولادة بنت المستكفي – ولم تكن صورتها لتغيب عن مخيلته طرفة عين :
إني ذكرك بالزّهراء مشتاقاً والأفق طلق ووجه الأرض قد راقا
وللّسّيم اعتلال في أصائله كأنما رقّ لي فاعتلّ إشفاقا
ولأمير الشّعراء أحمد شوقي قصائد عدّة في الرّبيع وورده مليئة بالصّور والجمال والدّهشة ، وإن كانت في معظمها تنزع منزع
الوصف الظّاهريّ أكثر من نزوعها إلى ملازمة الوجدان
أخيراً :

خاطبها بكلّ اللّغات لم تستجب . أهداها وردة حمراء ، فهمت كلّ اللّغات ! . ■

NARÎN OMER :

“hevaltiya min û
nivîsandinê ez ji pêlan
û reştarî û zordariyên
gerdûn û jiyanê parastim”



Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

10

(Li Dêrika Rojavayê Kurdistanê ji dayik bûye, Xwendina serete û navendî û bi domahî di dîbiştanên Dêrikê de bi dawî kiriye, û piştî ew tevî Zanîngeha “Dîmeşq”ê paytexta Sûriyê bûye û di sala 1995an de xwendina zankoyê bi dawî kiriye, “Beşê

wêjeya Erebi”, di kulîjeya Adab de. Wê karê mamoteyîyê kiriye û di hemî

pêvajoyên fêrbûn û xwendinê de. Sisê zarokên wê hene “Daştan, Sazîn, Şêrîn”.

Destpêka nivîsînê wê: Helbest, roman û gotarê dinivîse û gelek xelatên wêjeyî wergirtine.)

-Em hezdkin ji çîroka we û nivîsandinê dest pê bikin, kengî û çawa we xwe berda vê deryaya bê binî ? Di der barê wan destpêkan de hûn çi dikarin ji me re bibêjin ?

Ez dibêjim hezkirina wêje û nivîsandinê û hevaltiya min û pênuşê di malzaroka

dayika min de bi min re çêbûye û tovên wan di kakila heşt û ramanên min de hatiye çandin, ya didwan ez di malbateke welatperwer û rewşenbîr de perwerde bûme, birayê min û lawên meta min û xal û mamên min xwendevan bûn û tevî xwendinê ew rewşenbîr û konevan bûn û bi nivîsîn û wêje ve girêdayî bûn û herdem ez li civatên wan amade dibûm û min bi kêf û evînî guh dida wan û tiştên balkêş ew pirtûkxaneya di mala me de kû ew xemilandî bû ji hemî rengên zaniştî û rewşenbêriyê, lê kesê kû ev guhdan û hezkirina han li min dîtî xuha min Perîxan bû ya kû bê dîbiştan xwe fêrî alfabiya kurdî û erebî kiribû û pir bi min re arîkar bû û rêk û pêkên rast û dirûst li pêş min didanîn.

-Nivîsandin ji bo we çi wateyê dide ? Nivîskar ji kê re dinivîse ?

Ev hevaltiya di navbera min û pênuş û nivîsandinê de çêbûyî ez ji pêlan û reştarî û zordariyên gerdûn û jiyanê parastim ta vê demê û bi wan evîniya jiyan û zemîn û kesan bi min re geştir û xweştir bû, ji

vê yekê ez dibînim nivîser ji bo xwe dinivîsîne da ew wêneyên hizr û heştên xwe bilorîne û wan aram bike û piştê ew bi civak û ax û welat ve tê girêdan û rewşa wan li ser xaka ritalîzme diyar dike. Divê nivîskar bi xwe û bi dana xwe bibawar be da bikaribe heşt û ramanên xwe derbasî derûn û mejiyê xwendevan bike û bi xwe re rast be ne tenê binivîse da bercewendiyê kesane bişopîne û bi cih bîne. Her kes ji me hizir dike û dirame lê ne her kes dikare bi pênuş û peyvan wêneyên jiyanê di hemî aliyan de bixemilîne û rengreng bike û ne her yek rahêje pênuşê û çend peyv û hevokan binivîse dibe nivîskar û helbestvan.

-Helbest guvaşa heşt û ramanên helbestvan e, awazên giyanê wî ye. Berî ku em derbasî nava helbestên we bibin, Narîn Omer wek helbestvan çawa li helbestê dinêre ?

Helbest di nerîna min de dermanê êş û janên bê derman in ji ber kû ew bêhtirîn tovên hebûna xwe ji cinav û heştan tîne û çiqas ev nerm û zelal bin ewqas ew mifayê ji helbestê dibînin ji ber kû helbest ji destpêka zayîna min ve dermanê dil û derûniya min e û sîbera berdewamiya min e.

-Di nivîsandina helbestê de hûn bêtir guhdanê bi çi dikin ? bi mijar, raman û naverokê, an bi şîwazê hunerî ?

Bi dîtina we çawa helbest tê avakirin ?

Bi rastî guhdan bi van hemyan dibe û her yek ji wan dibe stûna helbestê ya herî giring û dibe ew şert û merc di yek helbestê de pêk bên li gor bûyerên kû ew li ser tene avakirin lê di hemî mijaran de ez guh didim heşt û hezkirinê ji ber kû bi wan mirovatî geş û zelal dimîne.

Dibe helbest ji nişkî ve bi bawesînka xwe me hînik bike û dibe em derbasî hola wê bibin û çiqlekî li dara wê zêdekin.

Helbet helbest ji hunerê cuda nabe û

henasên wan li ser yek rîtmê semadar dimînin û giyan û dil kêfxweş dikin.

-Di navbera herdu zimanên (Kurdî û Erebî) de, Narîn Omer bi kîjanî bêtir dikare xwe derberîne ? kengî bi Kurdî û kengî bi Erebî hûn dinivîsin ?

Zimanê me dimîne bingeh û yekemîn zimanê em jê hezdkin û di himbêza wê de em xwe payadar û zengîn dibînin. Ji zaroktiyê ve min xwe fêrî nivîsandin û xwendina zimanê me kiriye li gorî erîşenên di wê demê de û min bi zimanê me bi dest nivîsînê kiriye û piştê bi zimanê erebî û bibawerim kû ez dikarim bi herdu zimanan binivîsim. Dem ji nivîsandinê re tune ye li gor bûyeran û rewşa rojane dimîne û carcarna ez eynî mijarê bi herdu zimanan dinivîsim.

-Di hemû nivîsên we de jin bi xurtî amade ye, pîrsgirêkên wê û êş û azariyên wê, lê herdem ew jin şikestî ye. Gelo heya çi radeyê we dikarîbû bi rêya pênuşa xwe berevanî di ber doza jinê de bikiraya ?

Belê tevî ez mijarên cor bi cor dinivîsînim lê pîrsa jinê amade ye ji ber kû dema min bi dest nivîsîn û çalakiyên wêjeyî û civakî kiribû ji berî 30 salan hijmara jinên me yên bi nivîsîn û çalakiyan û rewşenbîriyê ve mijûl pîr kêmbû û ne tenê jin bekê hijmara mêran jî kêmbû û ew bi tiliyan dihatin hijmartin, min xwest ez doza jinê bikim mebest û keç û jinên me agahdar bikim û pîrs û doza wan li ber çav deynim

Ez bibaweim ez b karênd baş rabûme bi avakirina komele û girûp yekîtiyan re.

Hêjayî gotinê ye ez diyar bikim kû guvaşa ezmûna min di vî warî de pîr tişt ji min zelal kirin û ji wan:

Kû pîrsa jinê berevanî û berxwedan jêre navê ji ber kû jin a jîr û jêhatî dikare mefên xwe çareser bike bi kar û xebata xwe ya berdewam û bi dilpakî û dilsozî, lê dema beravanî jêre bibe û mafên wê çareser bibin bêtirîn caran jinên di nav bercewendiyên û ezeziyê de noq bûyîn bi dest û lepan wan mafan asê dikin û

xwe didine pêş bê kû bikaribin tiştêkî bikin. Divê doza jinê di destpêkê de bi vên û dilsozî û hêza jinê bê destpêbikin û piştî wê civak alîkar be.

-Gelo wêje neynika jiyanê ye, an alaveke guhertinê ye ?

Em dikarin bibêjin ew neynika jiyanê ye û alaveke guhertinê ye jî, ji ber kû ew xaka riyalîzmê û civakê bi hemî wêne û tabloyan ve vajî dike û dineqîşîne û piştî hewildan dide kû ew wan bero guhertinê bişopîne yan jî riya guhertinê li ber çav bînin û çareser bikin

- Jin dikare çi li helbestê zêde bike ?

Ez dibînim kû cudabûn di nav bera nivîsîna jin û mêr de tune ye ji ber kû helbest û wêje bi giştî ji axoşkirina heşt û ramanan şîn dibe û şaxan di dil û mejî de vedidin û pîvana heşt û ramanan li ba jin û mêr wekheve, lê em dikarin erê bikin kû jin dikare li ser pirs û doza xwe bêtir biaxeve û wêneyan bi xemilîne.

-We helbest ji bo zarokan jî nivîsiye, herî dawî dîwanek we bi navê (Kenê Şanya) derketiye- bi rastî helbestin bedew û nazik in- çi hêla ku hûn jib o zarokan binivîsin ?

Dema min hewildan dan kû ez di derya nivîsînî de melevaniyê bikim min civak û canîwerên jiyanê li ber hizr û çav deynan û ji wan zarok û pirs û mafên wan. Zarok kakila malbatê ne û malbat bingeha ciakê ye, û nivîsînên li ser zarokan pir kêr in di çand û wêje ya me de, lewra min helbest û kurte çîrok û li ser zimanê wan ji min ji wan re nivîsandin û piştî salên dirêj berhevoka "Kenê Şanya" ronahî dît û ez bihêvî me di rojên bê de bêtir berhemên min ji wan re ronahiyê bibînin.

-Di der barê berhemên we yê helbestî de, heya niha çi hene ?

Yên çapkirî min 3 berhevok helbest hene û 8 berhevok wek destnivîs hene bi kurdî û

erebî û helbestên pexşan û rêzbend.

-Emê derbasî beşê romanê bibin, jixwe heya niha sê romanên we derketine, hûn çawa li nivîsandina romanê dinêrin ?

Belê ew çar roman in ji ber kû romaneke min bi zimanê erebî xelata yekemîn standiye di pêşbirka romana erebî de ji aliyê "Dar elkelîmat" li welatê "Elcezayir".

Her yek ji celeb û texlîtên çand û wêje şert û mercên xwe hene lê hemî di dawî de li yek rê dicivin û komcivînan li dardixin û roman yek ji wan texlîtên herî girîng û di hola wêde nivîskar dikare pir rêk û pêkan bişopîne û bi gelek mirov û canîweran re bijî û biaxeve û hefsarê bîrok û mejî berde da hizr û raman û heşt bihevîre çandiyê bikin bi serbest û azadî.

- Şîwazê helbestî ji vegotinê di romanên we de diyar e, gelo ev yek bandorê li aliyê dramî nake ?

Min di bersiva borî de diyar kiribû kû hemî celeb û texlîtên wêje di yek rêkê de gava dawî dipîvên û ez dibînim divê roman ji heşt û peyvên cinavî bê par nemîn in da xwendevan bi bûyer û mijarên romanê ve werin girêdan û hedanîn û aramiyê binoşin û helbet di dawî de hebest dimîne helbest û roman dimîne roman.

-Di romana (Çaxê Derbideriya Ber Bi Rojava) de, tevî ku roman cîwerî ye lê we welat, dever û cih bi nav nekirine, gelo mebesta we ji dû ve yekê çi bû ?

Belê tu rast dibêji. Di vê romanê de min xwest ez dema bûrî û dema aniha bi hevdu girêbidim û diyar bikim kû vegotina dibêje "Dîrok xwe vedigerîne û dubare dike" rast e û cudawaziya di navbera wan de ew e kû tenê kes û mirov tene guhertin û ev çîrok û çîvanokên çêbûyî û aniha çêdibin ew berdewam in û helbet di pêşerojê de jî wê çêbin û hêzên mezin wê bi navê mafê mirovan û zaroktiyê bercewendiyên xwe

bi cih bînin, lewra min xwest kû ez welat û deveran bi nav nekim da her kesê vê romanê bixwîne xwe û civaka xwe bibîne lehing û xwediyên wê.

-Heya çi radeyê hûn xeyal û nîgaşê di romanên xwe de bi kar tînin ?

Bêtirîn berhemên min neynikin û bûyer û çîrokên çax û demê dineqîşînin û piştra xeyal û nîgaş rola xwe ya mezin dilîzin û wan bi reng û deng dîkin. Jiyan me bixwe ji riyalîzmê û xeyalê tê afirandin û eger xeyal û nîgaş têde nebe em ê nekaribin pîlan û kelemên felak û narvînê derbas bikin. Xeyal û nîgaş rojên min ji hêvî û omîdan dixemilînin û biwan ez pir xwen û daxwazan pêk tînim.

-Di navbera helbest û romanê de, Narîn bêtir xwe di kîjanê de dibîne ?

Ez xwe di helbestê de dibînim im wekû ez xwe di romanê de û her weha di gotar û kurte çîrokê de lê herdem helbest tabetmendiya xwe diçîne ji ber ew di hemî celebên wêjeyî de diyare çi wekû lîztvanê yekemîn yan jî wek mêvan.

-Projeyên we ji bo siberojê çi hene ?

Proje pir in çi wêjeyî bin yan jî çandî û civakî û niha ez pirtûkên xwe ji çapê re amade dikim, 8 pirtûkên çapkirî hene û bêtirî 20 berhemên reşnivîs jî min hene xwezî ez bikaribim wan çab û belav bikim.

- Gotina we ya dawî ?

Qefdên spasî û dilsoziyê ji we re û dana we pîroz û xwmiandî bimîne. ■

Berhemên wê yên çapkirî ewin:

“ Hinga bêdengî can dikêşe, حيث الصمت helbest ji

weşanên çapxaneya dar azzeman “Perîxana min” bi arîkariya saziya Semakurd hatiye çapkirin.

Romana”ÇaxêDerbideriyaBer Bi Rojava) موسم النّزوح إلى الغرب

Romana”Henasênjiyanê, Koçberiyabêhenas”ÇapxaneyaSersera li Berlînê, Elmanya

Pirtûka” Tîrêjênvejinê ” ÇapxaneyaSersera, Berlîn, Elmanya, Dr. Beşar Mişefa.

Romana “AxoşkirinaPênûsêjîdemsalêngiyanê re” jiçapxaneya Elsukeriye li welatê Misrê.

Kenê şanya” helbest, jiweşanênYekîtiyanivîskarênKurdiştanaSûriyê.

Romana “Pîspîsênbîrokê” çapxaneya Dar elkelîmat, welatêElcezayir.





KARKIRÊN ROJAVA DI ROJA CEJNÊ DE LI SER KAR IN

Efsan Kurdî

di vê rojê de kesê bazirgan û xwedî pere tenê derdikevin seyranan, ji wan diqede lê ji yên wek min naqede.

Eger bû û em di vê rojê de neçûn ser karê xwe jî, emê li mala xwe rûnin, em nikarin wek wan bikin û derkevin seyranan û şahiyê bi cejna xwe bikin.

Mihemed karkerekî din e, karê avahiya xaniyan dike, di derbarê zehmetiyên kar û jiyana kakeran ji kovara welat re axivî û got :

Li welatê me qedr û qîmeta karkeran tineye, herdem xwediyên kar dixwazin keda wan bixwin û mafên wan daqurtînin, ti zagon jî tineye ku mafê wan biparêze.

lê ji bo kirêdesta karkiran bazarên hişk û asê dikin da ku kêmtirîn pereyan bidin wan.

Ez bi hêvî me ku rêz û hurmet ji keda karkeran re bê girtin, û rewşa wan ya aborî bê başkirin da ku bikaribin jiyanekê bi rûmet bijîn. ■



Wek ku tê zanaîn, 1ê Gulanê li seranserê cîhanê cejna karkiran e, ev roj li hemû deverên cîhanê roja betlane û bêhinvedanê ye ji bo hemû karkiran.

li gelek deveran div ê rojê de karkir dadikevin xwepêşandanan û doza mafê xwe bikin, hin din jî şahiyên li dar dixînin.

Li devera me, bi rengekî fermî 1ê gulanê lib a saziyên dewletê û yên rêveberiya xweser roja betlanê ye, gelek xelk û hin aliyên siyasî jî derdikevin seyranan û şahiyên li dar dixin, lê haya xwediyê cejnê (karkir) ji vê rojê qet tune û wek hemû rojan derdikeve ser karê xwe, ji ber ku wek ku ew dibêjin roja ku têde karnekin xerjiya jiyana wan tineye.

Hin ji karkiran jî di vê rojê de derdikevin seyranan. Karker Ferîd Husên hesinkarî ji Amûdê ye di der barî cejna karkeran de ji kovara welat re axivî û got :


Karê min gelek zehmet e, ne herdem jî heye, heftiyekê ez kar dikim hefteyekê betal im, dema ku kar hebe neçarim li ser karê xwe bim, ji ber ku debara jiyana min bi vî karî ye.

Di roja cejna karkiran de, nikarim karê xwe rawestînim ji ber ku em ji karê destê xwe dixwin,



FERHENGOK

hedar	صبر
hingavtin	طعن
herewez	تعاون
hêwî	رطوبة
hevyazî	ترجيح
hilavistîn	تعليق
hiliştin	استيقاظ
Hilperîn-sema	رقص
hingûr	وقت الأصيل
şehîn	سهيل الخيل
holik	كوخ-عريشة
pîn	كوخ الدجاج
hox	الأرض المفلوحة
bender	ميناء
hilname	عريضة
hizir	فكر
havl	حاصل
haydan	تحذير
tevn	نول
hevde	خيط النسج



SÊNIYA CÎRANAN DI MEHA REMEZANÊ DE

kovara Welat

Ji Kevin de û li nav kurdan gelek reftar û adetên civakî peyda dibin ku nêzîkahî û têkiliyan di navbera cîran û cîran de xurt dikin.

Gelek ji wan reftaran heya îro roj tene dîtîn û tene jiyandin, yek ji wan sêniya cîranan yan jî para cîranan e. Ev adet bêtir di meha rojiyê de diyar dibe.

Berî fitorê bi çend xulekan sêniyên xwarinê di navbera malên cîran de tene veguhestin, her kevaniya malekê ji xwarina xwe sêniyekê ji bo cîranan dadigire û ji wan re dişînin, bi vî awayî xwarinê cûbicûr li ser sifreya fitorê dicivin.

Lê di salan dawî de ev adet kêmtê dîtîn û nema wek berê bi rengekî berfireh diyar dibe.

Di der barê vê reftarê de Ca Nîdal ku ew kevaniya malekê ye ji kovara welat re axivî û got :

" Parvekirina û veguhestina xwarinê di navbera cîranan de di meha pîroz de adeteke kevn e, û gelek xweş e. di vê mehê de berî fitoran cîran beşekê ji xwarina xwe dixin sênîkan û ji hev re dişînin. Bi vî awayî sifreyên malan bi xwarinên cûbicûr dixemilîn. Ev adet pir baş e, lê gerek ev xwarina ku em ji cîranên xwe re dişînin bêtir ji bo malên xizan û feqîr bêne şandin, ne tenê di meha rojiyê de lêbelê di hemû demên salê de.

Li Amûdê Gelek malên feqîr hene ku li xwarina xwe diheyirin, divê berî her



kesî em ji wan re bişînin, nabe ku sêniya malên têr û dewlemend here malên wek wan têr, ezê gelek kêfxweş bim ku cîran tevde di vê mehê de xwedî li feqîran derkevin."

Di heman derbarê de Fatma mihemed ku ew jî kevaniya malekê ji Amûdê ye ji kovara Welat re axivî û got :

"Li Amûdê, hîn gelek adet û reftarên çê û qenc peyda dibin, ku ew li gelek deverên din dikin nevedî bibin, li cem me hîn têkiliyên civakî di navberê xelkê de xurt in. di şahî û şîniyan de, xelkên Amûdê hev û du digirin û li kêleka hev radiwestin.

Veguhestina xwarinê di navbera malan de reftareke kevn e, di hemû demên salê de tene dîtîn, lê di meha remezanê de zêde dibe, bêguman ev reftar hezkirin û hevgerêdanê di nava civakê de xurt dike.

Bi hêvî me ku ev reftar û adetên baş di nava kurdan de bimînin û ticaran ji holê ranebin." ■

مدرسة نمور التايكوندو

الدولية.. قصة نجاح

منقطحة النظير

تقرير مجلة ولات

تعتبر رياضة التايكوندو من أقدم الرياضات التي عرفها الإنسان و قد ظهرت لأول مرة في كوريا

قبل أكثر من ٢٠٠٠ عام حيث أوجدها و طورها الكوريون كوسيلة لتعلم فنون الدفاع عن النفس و الانقضاء السريع و ذلك بسبب كثرة الحروب الأهلية و صعوبة الحياة وسط الحيوانات الضارية.

تعتمد رياضة التايكوندو على الركلات بصورة كبيرة إلا أنها لا تهمل استخدام اللكمات أيضا، و قد أصبحت رياضة رسمية في الألعاب الاولمبية التي جرت في سيدني عام ٢٠٠٠ بعد أن كانت رياضة استعراضية خلال الاولمبيات السابقة.

انتشرت هذه الرياضة في بقاع العالم و يمارسها الصغار و الكبار و من كلا الجنسين.

تلقى هذه الرياضة رواجاً كبيراً و إقبالا منقطع النظير في مناطق الجزيرة السورية و خاصة في الحسكة حيث ساهمت مدرسة نمور التايكوندو في نشر هذه الرياضة على نطاق واسع و يرتادها العشرات ممن يودون تعلم فنون الدفاع عن النفس و من كافة الأعمار.

حول تاريخ المدرسة و مشاركتها المحلية و الإقليمية و الدولية و أهم الانجازات التي حققتها تحدث الاداري في مدرسة نمور التايكوندو الدولية الماستر عبد العزيز عايي لمجلة ولات قائلا :

«تأسست المدرسة في عام ٢٠٠٩ بعد تحقيقي للعديد من النجاحات خارج سوريا فعند تواجدي في كوريا عام ٢٠٠٨ كنت أحلم بتشكيل فريق من أبناء شعبي للمشاركة في البطولات الدولية , لقد كان ذلك حلماً كبيراً بالنسبة لي .

مدرسة نمور التايكوندو هي المدرسة الأولى الخاصة برياضة التايكوندو على مستوى سوريا .

خلال وقت قياسي استطعنا أن نثبت أنفسنا على الساحة السورية حيث شاركنا في بطولة الجمهورية على مستوى الأشبال و أحرزنا المركز الرابع عام ٢٠١٠ و كانت المرة الأولى التي يشارك فيها فريق من الحسكة في هذه البطولة.

في ٢٠١١ حققنا الانجاز الأكبر على مستوى سوريا حيث أحرزنا المركز الأول خلال مشاركتنا في بطولة الجمهورية التي أقيمت حينها في حلب لكن عند عودتنا تفاجئنا بقرار الاتحاد الرياضي السوري الذي طالب بتشجيع المدرسة بالشمع الأحمر و إغلاقها إلى إشعار آخر أما السبب فهو لأننا تحدثنا باللغة الكردية خلال تواجدنا في البطولة، قلنا لهم حينها بأننا لن نغلق المدرسة و أن أردوا إغلاقها فليأتوا و ليغلقوها بأيديهم، لقد أثر هذا القرار على معنويات اللاعبين و أفقدهم الشعور بفرحة الانجاز.

لكننا تابعنا طريقنا بإصرار أكبر و خلال عام ٢٠١١ شاركنا باسم محافظة الحسكة في العديد من البطولات على مستوى سوريا سواء على مستوى الشبال أو السيدات و أحرزنا المراكز الأولى .

في ٢٠١٢ و بعد قيام ثورة روجآفا توجهنا نحو العالمية عبر بوابة إقليم كردستان العراق الذي فتح لنا الطريق للعبور عبر مطاراته و قدم لنا الكثير من التسهيلات فشاركنا في بطولة (أوكسجين انترناشيونال) على مستوى آسيا و أوروبا التي أقيمت في تركيا و أحرزنا المركز الأول و للمرة الأولى رفعنا اسم روجآفا في المحافل الدولية مما دفع بالسلطات التركية إلى إصدار قرار يمنع فيه دخول فريقنا إلى تركيا اضطررنا حينها للعودة إلى الوطن عبر الدرياسية.

ثم شاركنا في ٤ معسكرات تدريبية في إقليم كردستان العراق و بالرغم من ظروف الحرب و الهجمات الإرهابية على مناطقنا خاصة أعوام ٢٠١٤ و ٢٠١٥ فان التدريبات في المدرسة لم تتوقف لحظة و كانت استعداداتنا مستمرة من اجل المشاركات الدولية .

في عام ٢٠١٦ شاركنا في بطولة البرق الدولية التي أقيمت في الأردن و حصلنا على ٦ ميداليات على مستوى العرب و شرق المتوسط .

بعد هذه البطولة دخلنا مرحلة جديدة حيث أصبح لنا حضور و اسم في الساحة الدولية كمدرسة نمور التايكوندو فكثفنا تدريباتنا استعدادا لمشاركات ٢٠١٧ حيث كان أماننا ثلاث استحقاقات واحدة في كوريا و ثانية في الأردن و أخرى في إقليم كردستان العراق و استطعنا تحقيق مراكز متقدمة في المحافل الثلاث و وصلنا إلى موندリアル التايكوندو الدولي في كوريا الجنوبية .

خلال عامي ٢٠١٨ و ٢٠١٩ أيضا كانت لنا مشاركات خارجية و قد حققنا العديد من الانجازات منها المركز الأول على مستوى السيدات.


حاليا أماننا العديد من المشاركات الخارجية و سنشارك بالمستويات العليا أي ماستر حاليا نعمل على تشكيل فرق خاصة بالأطفال و الشبال و السيدات، يبلغ عدد اللاعبين و المتدربين في مدرستنا أكثر من ٥٠٠ من كافة الأعمار و من الجنسين.»

جدير بالذكر بان مدرسة نمور التايكوندو الدولية تشهد إقبالا كبيراً من قبل الأهالي حيث ساهمت المدرسة في ازدهار رياضة التايكوندو في الحسكة.



ÇAR HELBESTÊN

FEDERICO GARCÍA
LORCA



Wergêr Şêrko Dakorî

Qesîdeya Sorgulê*

Sorgul

ne li rojhilatinê digeriya:
Nêzîkî sermedê li ser şaxê xwe,
li tişteki din digeriya.

Sorgul

ne li zanînê yan tariyê digeriya:
Li ser sînorê laş û xewnê,
li tişteki din digeriya.

Sorgul

ne li sorgulê digeriya.
Bêtevger li ezmanan
li tişteki din digeriya. ■

IV. Canek nepend

(Ji Lawikek şînî ji bo Ignacio Sanchez Mejias)

Ga te nas nake û ne dara hejîran,
û ne hesp û ne gêrikên li mala te.
Zarok te nas nake û ne êvar,
ji ber tu heta sermedê miriye.

Piştî lat te nas nake,
û ne satana reş li cihê tu lê perçe bû.
Bîrhatina te ya lal te nas nake,
ji ber tu heta sermedê miriye.

Wê payiz vegere digel guhmasî,
rezên di nav mijê de, û rêzdeyên çî-
yayan,
lê tiyek ji wan wê nexwaze rast li çavên
te binere,
ji ber tu heta sermedê miriye.

Ji ber tu heta sermedê miriye,
wek hemû miriyên li ser vê erdê,
wek hemû miriyên jibîrkirî
di nav komeke kûçikên fetisî de.

Kes te nas nake. Ne kes. Lê ez li ser te
distirêm.
Ez ji bo dema bê li ser jînnamê û şoxiya
te distirêm.
Sewhana zanebûna te ya bijarte.
Dilbijîna te ji bo mirinê, û çêja wê di
devê te de.
Ew xemgîniya di kêfa te ya mêrxas de.

Ne nêzîk, û belkî ne ti caran, wê Ende-
lus
mêrekî wiha bala û xwedî şerûdî
bibîne.

Ez li ser çelengiya wî distirêm bi pey-
vine tije nalîn,
û bahîneke kovan di darên zeytûnan de
tê bîra min. ■

Qesîdeya Jina Paldayî*

Dîtina te gava tu tazî yî bibîranîna erdê ye.
Erda şayik, bê ti şopên hespan.
Erda bê pincar, teşeyekî xwerû
girtî ji pêşerojê: sînorekî ji zîv.

Dîtina te gava tu tazî yî nasîna bêrîkirina
baranê ye dema li newqên nazik digere,
yan taya ku deryaya rûfireh digire
bê ku şewqa li ser hinarokên xwe bibîne.

Wê dengê xwînê li odeyên xewê vede
şûrekî çirisî di destê wê de,
lê tê nas neke dilê beqê
yan binefş li kû veşartî ne.

Zikê te kêferateke rehan e.
Lêvên te berbangeke bê kemere ne,
û li bin sorgulên germ ên textê te
mêrên mirî dinalin, li bendî dora xwe. ■

Strana Heyvê

Heyv hate kûra hesinkar
bi kirasê xwe yê ji gulgenimê bihnxweş.
Lawik lê dinere û dinere.
Lawik qenc lê dinere.

Di hewayê tengijî de
heyv piyên xwe hildide
û sînga xwe ya ji çingoyê deqandî,
zelal û bikêş, derdixe.

Bazde heyvê bazde bazde.

Ger qereçî bîn,
wê hingulîskên zîv û gerdeniyan
ji dilê te bideqînin.

Lawiko bihêle ez semayê bikim.
Gava qereçî bîn,
wê te li ber sindan bibînin
û wê çavên te yên biçûk girtî bin.

Heyvê bazde bzade,
dengê simên hespên wan tê min.
Min bihêle lawiko,
pê li sipîbûna min a ji nişayê neke.

Siwar nêzîk bûn,
bi rê de li dahola deştan didan.
Lawikê di kûrê de
çavên xwe yên biçûk girtin.

Di nav darên zeytûnan re,
di bronz û xewnan de qereçî gihan.
Serên wan bilind
û çavên wan nîvgirtî.

Çawa şev helû distirê,
Çawa li ser darê distirê!
Heyv bi ezmanan ve diçe
û destê lawikekî girtiye.

Li ber kûra hesinkar
Qereçî digirîn û dikin qîrîn.
Ba temaşe dike û temaşe dike
Ba şevê gişî temaşe dike. ■

Lorca bi xwe peyva "Qesîde" ya Erebi bikar aniye.





مدرسة نمور التايكوندو الدولية قصة نجاح منقطة النظر



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya



العدد (٦٣) ٢٠١٩/٦/١ م